Kurmanji Roman - Handana Nivîsarên Pîroz - Comfort Scriptures

2 Korîntî II. 1:2-4 Ji Bavê me Xwedê û ji Xudan Îsa Mesîh, kerem û aştî li ser we be. 3 Xwedayê ku Bavê Xudanê me Îsa Mesîh e, Bavê dilovaniyê û Xwedayê hemû handanê pîroz be. 4 Ew di her tengahiya me de hanê dide me, da ku em bikarin bi wê handana ku em bi xwe ji aliyê Xwedê ve tên handan, hanê bidin wan ên ku di her cûreyê tengahiyê de ne.

Zebûr 25:16,17 Li halê min binêre, li min were rehmê; Çimkî ez bindest û bêkes im. 17 Zêde dibe tengahiya dilê min, Tu xelas ke min ji derdê min.

Zebûr 32:7 Tu yî stara min, Tu min diparêzî ji tengahiyan, Bi îlahiyên rizgariyê dipêçî dora min.

Zebûr 34:18 Nêzikî dilşikestiyan e Xudan, Ruhê wî rizgar dike bindestan.

Zebûr 38:8 Nema taqeta min, ez pirr pelçiqîm. Nalînên min, ji ber êşa dilê min.

Zebûr 40:3 Wî stranek nû kir devê min, Ji bo Xwedayê me îlahiyek pesindanê da min. Wê gellek bibînin û bitirsin, Û bi Xudan ewle bin.

Zebûr 42:11 Tu çima xemgîn î ey canê min, Bo çi dinale hundirê min? Hêviya xwe bi Xwedê ve girêde, Ezê dîsa jê re spas bikim; Çimkî ew e rizgarkar û Xwedayê min.

Zebûr 50:15 Di roja xwe ya teng de gazî min bike, Ezê te rizgar bikim, tê rûmetê bidî min.

Zebûr 55:4 Dilê min ji kûr ve dinale, Sawa mirinê ket ser min.

Zebûr 61:2,3 Gava ku dilê min dixeriqe, Ez bangî te dikim ji vî kujê dinê. Tu min derxe wî zinarê ku ez nagihîjimê, 3 Çimkî tu ji bo min bûyî star, Li hember dijmin bûyî birceke hêzdar.

Zebûr 62:8 Ey gelê min, hergav tu bi wî ewle be, Dilê xwe birêje ber wî, Çimkî Xwedê stargeha me ye.

Zebûr 73:26 Bedena min û dilê min dihele, Belê hêza dilê min, Û para min hergav Xwedê ye.

Zebûr 77:2,3 Di roja teng de ez li Reb digerim, Ez bi şev destê xwe vedikim, Canê min teseliyê naxwaze. 3 Ez Xwedê bibîr tînim û dinalim, Ez difikirim û ruhê min dixeriqe.

Zebûr 85:6 Da ku gelê te bi te şa be, Tê me cardin nevejînî?

Zebûr 86:11 Ya Xudan, riya xwe hînî min bike, Ez li gor rastiya te bimeşim, Dilekî yekpare bide min, da ku ez bitirsim ji te.

Zebûr 109:22 Çimkî ez bindest û hejar im, Ji hundir, ji dil ve birîndar im.

Zebûr 112:7,8 Ew natirse ji xebera xerab, Bi Xudan ewledar e, dilê wî bêleq e. 8 Ew mêrxas e, natirse, Di dawiyê de, têkçûna dijminên xwe dibîne.
Zebûr 119:111 Şîretên te her û her ji bo min mîras in, Ew şahiya dilê min in.
Zebûr 128:2 Tê keda destê xwe bixwî, Ewê dilgeşî û firehî ya te be.
Zebûr 138:7 Ez bikevim tengahiyê, tu canê min diparêzî, Li hember hêrsa dijminên min, tu destê xwe radikî, Bi destê xwe yê rastê, tu min xelas dikî.
Zebûr 143:4 Loma ruhê min di hundirê min de dixeriqe, Dilê min perîşan e.
Zebûr 147:3 Ew dilşikestiyan baş dike, Û birînên wan dipêçe.
Yûhenna 14:1 «Bila dilê we reht nebe. Baweriya xwe bi Xwedê bînin û baweriya xwe bi min jî bînin.
Yûhenna 14:27 «Ez aştiyê ji we re dihêlim; ez aştiya xwe didim we. Ez wek ku dinya dide we nadim. Bila dilê we reht nebe û netirsin!
Yûhenna 16:6 Îcar ji ber ku min ev tişt ji we re gotin, dilê we bi xemgînî tije bûye.
Yûhenna 16:20,22 Bi rastî, bi rastî ez ji we re dibêjim, hûnê bigirîn û li xwe bixin, lê dinya wê şa bibe. Hûnê xemgîniyê bikişînin, lê xemgîniya we wê bibe şahî. 22 Niha hûn jî xemgîn in, lê ezê we dîsa bibînim û dilê we wê bi şahiyê tije bibe. Û tu kes vê şahiya we ji we nastîne.
Karên Şandiyan 2:46 Her roj bi hev re di Perestgehê de diciviyan, li malên xwe nan dişikandin, bi şahî û bi dilekî xwerû xwarin dixwarin.
Romayî 9:2 Xemgîniyeke min a mezin û di dilê min de êşeke bêrawestin heye.
2 Korîntî II. 2:4 Ne ji bo ku hûn xemgîn bibin, lê belê ji bo ku hûn hezkirina min a zêde ya ji bo we bizanin, min di nav gelek tengahî û êşa dil de û bi hêstirên çavan ji we re nivîsî.
Efesî 5:19 Ji hev re Zebûr, lavije û stranên ruhanî bêjin, di dilê xwe de ji Xudan re stran û lavijeyan bistrînin.
Filîpî 4:4 Hergav bi Xudan şa bibin; ez careke din dibêjim, şa bibin!
Aqûb 5:13 Eger di nav we de yek êşê dikişîne, bila dua bike. Eger yek dilşa ye, bila lavijeyan bêje.

Pastor T. John Franklin
Church of Salvation, Healing, and Deliverance
COS-HAD.org